



© Particular

JUWAN ABD RAHMAN KHALED

AKTÎVÎSTÊ MAFÊN KURDAN

BI ZORÊ JI ALÎ AJANÊN DEWLETA SURÎ VE,
JI 3 ÎLON 2012 VIRDE HATÎYE HUNDAKIRIN

Juwan Abd Rahman Khaled endamê Yekîtiya Ciwanên Kurdên li Sûrî ye, ke grûbek aktivîstên Kurd in.

Dema ew kesên ku wekî ajanên Ewleyê Dewleta Sûrîyê tên zanin, avêtin ser mehela Wadi al-Mashari, li bakûr-rojavayê Şamê/Dimişq, digel çend kesan ew hat binçavkirin, di şefeqa sibê roja 3 Ilon 2012 de.

Jibo sedemên binçavkirina wî yan jî wî birine kuderê ewana qet agahdarî nedan û heta nuha jî desthilatan derwarê qedera wî, da ku li kudrerê ye, herçend hate xwestin jî, qet agahdarî nedane.

Girtîkî ku hatibu berdan go ku ewî pey girtina wan, Juwan Abd Rahman Khaled li beşa Ewleyî ya Dewletê li Şamê/Dimişq dîtîye, bes nayin zanîn cîyê ku nuha tê girtin kuderê ye. Pey girtina wî zarokê wî yê 3 hat dinyayê.

Sedemên girtina Juwan Abd Rahman Khaled nayên zanîn. Demên berê jî ew hat cezakirin û hat bin çavkirin di sala 2004 derwarê bûyerên li bajarê wî, li Qamişlo de. Pey berdana wî, ewî gotibû ku ew, hatibû îşkencekirin hetanî movika pişt a wî şikandin. Demek kin pey destpêka tengzarîyê, tîsa ew hate binçavkirin di Adar a 2011 de, û di girtîgeha Istixbarat a Eskerî ya Sûrî de 50 rojan ma

KIRDARÎ/AKSÎYON

Ji kerema xwe bi rêya Berpirsiyarê Sûrîyê Herdem li Yekîtiya Netewan (YN) re, ji Serokkomarê/Reisêcumhurê Surîyê re binivîsîn da ku ji desthilatdarên Sûrîyê re bêje:

- Juwan Abd Rahman Khaled berdîn, heger bi sûcek tên nasîn nehatîye gûman kirin û li gor standartên dadgerîna adil ya navnetewî, ew nehatîye mehkemekirin
- Bi lez agahdarî bidine malbata wî ka ew li ku ye û çî bi bi serî wî hatîye
- Bawer be ku ew, ji binçavkirina dizîkî, îşkence, û muameleyên xerab bê parastin, û destûr bidin ku zû pêywendî digel malbata xwe û parêzgerê —ke ew duxaze, çêke.

Representante permanente ante la ONU
Bashar Ja'afari, Ambassador Extraordinary
and Plenipotentiary
820 Second Avenue, 15th Floor,
New York, NY 10017
Fax: +1 212 983 4439
Correo-e exesec.syria@gmail.com
Hîtab/Salutation: Your Excellency

**AMNESTY
INTERNATIONAL**

